

Qewîtiya Bav û Bapîran

“Tifaq û Yekgirtin”

»»» R:8



Mizginiya bê mînak

»»» R:3

*Bideştveanîna mafên netewî yên gelê kurd
di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

Agirî

Duheftînameyek Siyasetî-Gîştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdi
www.agirimedia.org Hejmar (429) 06-09-2022 Buha (1000) Tûmen

Paşhatên çikbûna gola Urmiyê

»»» R:4

Alman dixwaze girîngiyê bide çand û zimanên cuda


»»» R:7

Xermanana bixwîn

Meha Xermananê jî weke hemî meh û rojên dinê yên dem û salê, tijiye ji bîreweriyên tehl û pir xwîn û bi keser bo azadîxwazan û xelkê Rojhilatê Kurdistanê. Di vê mehê de xwîneke zêde li ber cêstê doza berheq ya gelê me çûye û nîrxên mezin hatine danê.

Di 26ê meha Xermanana 1371'an de, Dr. Sadiq Şerefkendi Sekertêrê Giştî yê Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, tevî Fetah Ebdulî nûnerê Hizbê li derweyî welat, Homayûn Erdelan nûnerê Hizba Demokrat li welatê Alman û Nûrî Dêhkurdî xebatkarê siyasî û dostê PDKÎ, di dema civîna opozisyonê li reştûrana Mîkonosê de, kevtn ber destdrêjiya terorîstên rejîma Îranê û şehîd bûn.

Terora Mîkonosê birîneke gelek kûr xiste ser cêstê tevgera rizgarîxwaziya Kurd li Rojhilatê Kurdistanê û bi taybetî bo Hizba Demokrat re êş û xesara wê gelek giran bû ku tazê 3 sal bû ku dîplomat terorîstên rejîma Îranê, rêberê mezin Dr. Qasimlo li ser maseya danûstandinê teror kiribûn. Hîn



birînen ji deşt dana Qasimloyê mezin nojdar nebibû ku deştê reş yê terorîzma dewletî, komara Îslamî cinayeta Mîkonosê jî encam da û Şerefkendi û hevalên wî jî teror kirin û ji me şandin.

Xermanan bo me gelê Kurd li Rojhilat û PDKÎ her bi wê hindê tenê xwînavî nine, birîneke din ya mezin jî eve ku, di sibêdeha roja 17ê Xermanana 1397'an a rojî, bin-

keyên Hizba Demokrat li derdora bajarê Koyê û di nav kûrahiya axa Başûrê Kurdistanê bû armanca êrişa Mûşekî ya rejîma cinayetkar ya komara Îslamiya Îranê, di encamê de dehan kes ji Kadr û Pêşmerge û endamên rêberiya Hizba Demokrat şehîd bûn.

Rejîma hov û dijî Kurd ya komara Îslamî bi bê berçavgirtina tu pîvan û yasayeke navnetewî, bi mûşekên herî giran

binkeyên Qela cihê civîna endamên rêberiyê û Fêrgeha deşt-pêkî ya Pêşmerge ya PDKÎ kirin armanç, ku mixabin bi vê hegerê ve, 17 kes şehîd bûn û dehan kes jî birîndar bûn ku jin û zarok jî di nav şehîd û birîndaran de hebûn.

Rejîma cinayetkar û terorîst a Îranê, jêvebû ku xortên şoreşgêr û Hizba Demokrat li ber evê ku rege binkên vê li Başûra Kurdis-

tanê ne û dikare bi wî awayî êrişî li ser bike û her tişt dawî pê tê, lê roja 21ê Xermananê gelê Kurd li Rojhilatê Kurdistanê di helwêsteke dîrokî û bê mînak de mangirtina giştî birê ve birin û seranserê Kurdistanê dukan û bazarên xwe daxistin û li malên xwe der nekevtin.

Ew helwêsta gelê me 2 armancên sereke hebûn, ya yekê ev bû ku mûşekbaran û êrişa cinayetkarane ya rejîma Îranê mehkûm û şermazar bikin, ya duyan jî ev bû ku gelê me bêje rejîma Îranê û hemî dujminan ku Hizba Demokrat tenê nine û parek ji cêstê mezin yê xelkê Rojhilatê Kurdistanê ye.

Xermanan ger bo me meheke pir xwîn û qurbaniye, lê hevdem mînaka waneya berxwedan û yekitiya gelê me li Rojhilat digel Hizba pêşenge xebata netewiya xwe ye. Em di devedevê salvegerên wan herdu bûyerên tehl dene, lewma bila em yadê wan şehîdên Xermananê bikin helwêsta bihêz û îradeya qahîm a şoreşvanî bi dijî rejîma terorîst a komara Îslamî.

Sergotar



N: Kerîm Perwîzî


Di dîroka neteweya Kurd de rojên tal û dijwar û gelek deman jî rojên pir karesat kêman. Komkujkirina Kurdan bi destê desthilatdarên weke dewra Sefewîyan û Osmanîyan bigre heta komkujî û malwêranîyên desthilatdariya Atatürk û Reza Pehlewî û herwisa rejîmên li pey yek yên Îraq û Sûriye heta niha jî li çend beşên Kurdiştan a dagîrkirî de, malwêranî, qetilkirin, komkujî û jînosayîkirina neteweyî berdewam e.

Her di vê Xermananê de rejîmên dirinde dehan tawan li dijî neteweya me û nîştimana me afirandine ku, tawana 17'ê Xermananê û moşekbarana binke, baregeh û malbatên Demokratê tawanek herî mezin a li dijî mirovahiyê ye ku rejîma Îslamî afirandîye, 26'ê Xermananê û terorkirina rêberê nemir Dr. Se'îd û hevalên wî li welatê Almaniyayê, ji aliyê terorîstên hatinê şandin li desthilata byoma Tehranê ve, rûpeleke reş a heta hetayî ye di nav çavên wîlatiya Feqîh de.

Rûpelên dîrokî ku hil didî, tijîn li rojên karesat û tirajîk bo neteweya Kurd û di vê rojmêra dîrokê de tijî nehametî de jî, rojên şahî û serbilindî û roja xweşabûn a neteweya Kurd bê hejmar in. Ewqas destana serhildan û berxwedaniya Kurdan, li pirtûk û rûlepên welat û xelkên din de jî deng veda ye.

Rojek din a dîrokê ku di heyama wan rojan de hatîye tomarkirin, roja 30'ê Gelawêjê ye, ku di rojmêra

Rojek din



serbilindî û xweşabûna neteweyî rûpeleke din tomar kir û bi rengê şîn yê esmanî hat xemlandin.

Roja 30'ê Gelawêjê roja geşbûn û çirîskîna şîn a esmanî bû ku, Demokratên piştî derbasbûna 16 salan tekoşîna cuda rêzên xwe rêk xistin. Û bo carek din Demokratbûna xwe kirin bi sîma û reng û dengê yekgirtinê.

Renge eger li gora hejmar û serjmêriyê hesab bikin komkujkirina bi hezaran kes endam û alîgirên herdu aliyên cuda tenê li tevlihbûna hezaran kesan be, lê li warê siyasî, dîrokî û paşeroja vî bûyera mezin hûr mîze dikî, dibînî ku komkîrîn û yekgirtina hezaran kesî bûye moral û hêz û bandor û karîkeriya hezaran hezar kesan, bi wateyek din di vî yekgirtinê de, yaku li ser hev dikeve tenê yek hejmar nine, belkî bihêzbûna morala gelekê û qahîmbûna refên xebateke bê rawestan û dengdanek di asta nîştiman, Îran, dever û cîhanê de ye.

Hêza pangurî yaku bi yekgirtinê tê rêkxistin û bi rêkxistin li kanala rast de dixê, koma sedan kesan dike bi hezaran kesan û bihezaran kesan jî dike û bo hezaran hezar kesî û xebata aliyekê dike bi xebata neteweyekê.

Her li derheq vî roja dîrokî de. Vî hindê jî li ser bêjin ku şanaziyeke mezin a din e ku di vî bûyerê de hat tomarkirin, ev bû ku Demokratên bixwe di rewta danûstandên din û dyalogê de ev serbilindî tomar kirin û bi tîgihîştineke dîrokî û modern li ser heştyariya xebatek rewya ya Kurdiştanê û hewcehiya nîştimanê bo Demokratek bihêz, ku danûstandin gihandin bi encamê û dîrokek afirandin.

Yekgirtina Demokratên daxwazkariya xelkekê bû ku, dilê wan bo nîştiman lîdida û bicîh anînana erkekê bû ku rêberên vî xebatê gihandin bi encamê û serbilindiyek bû ku, Demokratê bixwe û bi dyaloga navxweyî, navmala xwe rêkxist û her bi vî sedemê ye ku paşerojek geş bo neteweya me afirandine û çavê neteweyekê li ser vî xebatê û vî roja dîrokî ye, û paşeroj çavnehî Demokratê ye.

Mizginiya bê mînak



N: Nûredîn Sofîzade

Hinek bûyer di dîroka gelan de dibin xala gweherînê û weke deşpêka qonaxeke girîng tîr tomarkin, ev yek jî dibe mînakek herî baş bona piştgirêdana bi vê gweherînê, ji bona tevger û bizavê û pêşkevîtinê.

Dema ku ev mijar girîng be û peywendî bi gel ve hebe, û daxwaz û miraza giştî be, heçî dema ku hasil bibe û bê cî, weke mizginiyê mezin û dilxweşker di nav gel de belav dibe.

Yekgirtin û yekîtiya herdu baskên Hizba Demokrat jî bo gelê me li Rojhilatê

Kurdiştanê û hemî Kurdeke welatparêz mizginiyek mezin bû.

Serê 16 salan bû ku Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê raştî jihev weqetiyane hatibû û bi ser 2 baskan de parve bibû û weke 2 Hizbên cuda li jêr navên PDKÎ û PDK heçî kîjan ji wan 2 Hizbane bi awayê serbixwe kar dikirin.

Di heyama wan 16 salan de netenê weke 2 baskên cuda yên Hizbê, belkî mixabin parvekirina hemî hêz û şiyana vê Hizbê hatibû parvekirin, wek hitbara siyasî, hêza mirovî, hêza maddî, hêza piştewaniya gelê Kurd li Rojhilatê Kurdiştanê, endam, alîgir, û bigiştî her tişt parve bibû û hêza vê Hizbê ji hemî aliyekê, bo herdu Hizbên Demokrat gorî berî ji hev weqetiyane nivî bibû.

Wê yekê gelek xisr gihand doza Rojhilatê Kurdiştanê û Hizba Demokrat gelek derfet li meydana kar û xebatê de



ji deş dan.

Di wan 16 salên ji hev weqetiyane de, her kes û aliyekê seh bi wê xisarê kiribû û bitaybetî xelkê Rojhilatê Kurdiştanê weke piştewanê hertimiye Hizba Demokrat, tu caran bûna 2 Hizba Demokrat qebûl nekirin û bal wan wekî karekî nepesen û nejdilî wan di hate hesibandin, lewra berdewam bera pêla rexne û gazindên wan ji herduk baskên jev cudaye Hizba demokrat bû û berde-

wam daxwaza yekîtiyê û yekgirtinê dikirin.

Netewa me ku weke hizbeke herî mezin û xwedî bandor û li ser hêla xebata netewî û weke hizbeke herî kevnar di dîroka gelê me de 77 sale bê rawestan xebat kiriye, û di vê rêkêde jî gelek xwîn û nirxa mezin û rêberên xwe goriyê bideşt ve hatina armancê gel kirine, hemî ev xwîna jî li ber cêstê Rojhilat çûye û hekî Hizba Demokrat heya niha maye dewleserê piştewanî û xwedî derkevîna gel ji vê hizbê bûye, ev mafe didane xwe ku heyî û neyî ya vê hizbê ya xwe bizanin û lewma bû gelek caran cuda ji daxwaza yekgirtina herdu aliyên, ev haydariye jî didane kadr û Pêşmerge û rêberiya Hizbe ku êdî çiyê dinê ji wan qebûl nakin ku ew Hizbe her wisa bi 2 perçeyî bimîne.

Gelê Kurd li Rojhilatê Kurdiştanê, endam û alîgirên vê hizbê, malbatên serbilinde

şehîdên Kurdiştanê û bigiştî hemî xemxwarên vê rêbazê, gelek caran gotin û dane xuyakirin ku hizba demokrat tenê milkê wan kesan nine ku niha bi êşkera tê de xebatê dikin, belkî Hizba Demokrat milkê xwîna Hezaran Şehîdên Kurdiştanê û serweyî hemiya behra xwîna rêberên Mezin Qazî, Qasimlo û Şerefkendî ye û Hizba Demokrat yadigar û emanetê bi nirx û dîrokiye wane ku îro di deştê rêberên wê hizbê de ye û divê û erkê ser milê

wane ku wî emanetê wan biparêzin heya digehînine qonaxa serkevîtinê û dana mizgîniya rizgariyê bi wan.

Dema mirov bi wî awayî dîna xwe bide xwezî û çavni-hêriyên xelkê li derheq yekgirina Hizba Demokrat, dema Hizib xoşwanî û pêgeha xwe wiha di nava gel de bibîne, dema xistina serheve hemî hêza Hizba Demokrat ku me serve bas kir bi ser 2 aliyên de hatiye parvekirin bibe sedemê çêbûna Hizbekî bihêz li hemî meydana xebatê de, dema ku Hizba Demokrat bi yekîtiya ji nû ve ye xwe dilê malbatên Şehîdan û endam û alîgirên xwe û xelkê kurdiştan xweş bike, bêguman ragihandina yekgirtina herduk baskên Hizba Demokrat dibe mizgîniya herî mezin bo hemiyan.

Me dît ku digel ragihandina wê mizginiyê pêla şahî û pîrozbahî û dengwedana wê yekgirtinê, çiqas berfireh bû

û dilê doştan şad kiri û kela zilm û zordariya dujminan û bi taybetî îstûnên riziye rejîma Îranê çawan xistîne lerzînê.

Ev yekgirtina dawîya ducergeti û parvebûna Hizba Demokrate, ev yekgirtina divê bibe deşpêka qonaxeke nû ya xebateke bihêz û divê bikare gorî çavni-hêriya gel, bersivder be bona xebateke bi gur. Îro gelê Kurd li Rojhilat tenê Hizbeke Demokrat hene,

tenê rêber û pêşengeke xebata neteweyî hene, Rojhilat tenê adrêseke tevgera neteweyî demokratîk heye, vê carê Hizba Demokrat divê bi piştqahîmî û bi hêzeke mezin ve, xwe di meydana cur bi cure xebatê de wek dîplomasî, rêkxistinî, ragihandinî, medenî, çekdarî û pêşmerge, bikeve nava çeperên şoreşê. Yekgirtina Hizba Demokrat û xebata vê Hizbê nihapêde li jêr navê Hizba Demokrat a Kurdiştana Îranê de, bêguman vê hizbê, endam, alîgir, kadr, pêşmerge û rêberiya wê hizbê erkdar dike ku nihapêde milê xwe bidne berkar û xebateke bê rawestan li pêxema bideşt ve anîna mafê neteweyî û rizgariya Kurdistan, bê şik hingê ye ku hemî hêza Rojhilat li piştê wê hizbê dibe û ev jî bi piştewaniya hemî aliyaneya xwe bersiva erêniye wê mizgîniya mezin bidne Hizba Demokrat.

Paşatên çikbûna gola Urmîyê

N: Nîştiman Urmîye
W: Bêhzad Simko

Kirîza ekolojîkî li asta cîhanê

Pîştî şerê duyem yê cîhanê, guherîna rûkê erdê û li metirsîxistina ekosîstemê ku mirov bi awayê bi kom encam dide, bûye nigeraniyeke girîng a civaka cîhanî û wek mijarekê li warê ewlehiya cîhanê li çarçoveya jeopolîtîkê de cih girtiye.

Di vê prosejê de mijarên wek zêdebûna heşîmet, destêverdana raşteraşt a mirov li sirûştê bona dabînkirin û destpêragihîştin bi hewcehiyên girîng û ne girîng, lipeyketin bona qezenca zêdetir di çarçoveya geşedan û ... hwd û paşatên nexweş ên wek valakirina avên jêr erd, ji navbirina dariştan, zêdekirina çolan, roçûna erdê, hişkesalî, lezgîn bûna germîrbûna erdê û levîtînên bi sedema şewatên fosîlî li ser “Hewa, av, heli-yana cemedên cemseran û nazîkbûna qata Ozon”, roçûna axê, koçberbûna bi neçarî ya bi sedema guherînên deverî û ... hwd, li asta deverî, netewî û navnetewî û gerdûnî bi cih hiştiye û paşerojek nerohn û tarî li ser rêya paraştina jîngehê daniye, bi awayeke din, kirîza şartîjîk li ser sepî ye. Berdewamiya çawaniya jîn li nav parametren diyarîkirî ên geşeya bi dom xîstîye tarîtiyê. Lewma kirîza av û levîtîna hewa û jinavçûna jîngehê, yek ji girîngtirîn mijar û dijiwariyên jiyana mirov in ku li ser jîngehê bûye gef.

Pirsgirîkên jîngehê li deverên bakûrê rojava.

Di dehkên derbasbûyî de mifahwergirtina şaş ji jîngehê her weke deverên din ên Îranê, di bakûrê rojava de hebûye û bûye sedema pirs-girêkên berfireh ên ekolojîkî



Rojayayê Îranê, yek ji 6 deverên avrêja Îranê ye, ew dever li navbera parêzgehên Urmîyê ji sedî 46, Tewrêz ji sedî 43 û Sineyê ji sedî 11 de cih girtiye û wek mezintirîn gola navxweyî Îranê û yek ji girîngtirîn û bi nirxtirîn ekosîstemên Îran û cîhanê ye ku ekosîstema vê, mînakê ji devera avrêja dayxistî ye ku hemû avên devera avrêja ve bo vê golê diherikin.

Asta bilindahiya wê golê 1300 metran bilindtir ji asta deryaya azad e, ew gol ji warê berfirehî bîstemîne û ji warê şoratiyê de piştî “Behr El-Meyyit”, duyemîn gola cîhanê ye ku cihê herî kûr e wê golê 16 metir û bi awayê nêvîncî 5 metran kûr e, dirêjahiya nêvînciya wê golê 140 kîlometir û panahiya wê li navbera 16 heta 63 kîlometran e û qasa ava wê golê bi awayê nêvîncî 31 milyar merta 3cî hatiye berhevkirin. Ava wê golê ji 14 çemên hertimî, 7 çemên demkî, 39 rêyên lehiyan, kaniyên di bin golê û barîna raşteraşt a baran û befrê tê dabînkirin. (Komîteya Civakî-Çandî ya Stada Zindîkirina Gola Urmîyê 1394an a Rojî) Sedema çikbûn û zindînekirina gola Urmîyê

di vê devera girîng de; Lê, çikbûn an çikkirina gola Urmîyê trajîdiya herî serê ye û bi hegera vê yekê ku çavkaniyek ekolojîkî û aborî ye, dikare ji warên deverî û netewî de bê berbas û ji aliyê bikarhêneriyên cuda ên weke kontrolkirina lehiyan, geştîyarî û torîzm û ... hwd dibe ku mifah jê bê wergirtin. Û bi berçavgirtina aliyên cuda ên aborî, civakî û ekolojîkî, roleke girîng di bakûrê rojavayî Îranê de dilîze, bi vê wateyê ku bi çikbûna gola Urmîyê, çola xwê çê dibe û paşatên zêdebûna hişkatiyên xwê û şor li deverê û rabûna bayên tund û gerim bi taybet di demsalên germahiyê de ye û bi derbasbûna dem, erdên werzêrî û berxêrên deverê ber bi şorbûnê ve diçin û ji warê aborî, civakî û ekolojîkî ve dê karlêkeriyên kawilker li ser heşîmeta rûniştî li devera avrêja gola Urmîyê hebe û guherbariyên cur bi cur li warên aborî, civakî, jîngehî û jeopolîtîkî li xwe digre.

Taybetmendiya gola Urmîyê

Devera avrêja gola Urmîyê bi berfirehiya 51 hezar û 876 kîlometrên 2cî li bakûrê

gola Urmîyê ji 3 dehkan berî niha ve dest bi çikbûnê kiriyê, asta avê kêmbûneke gelek zêde hebûye, herwisa bûn bi hilim a ava golê, bikaranîna zêde û neyasayî ji avên binerd bûne sedema dijiwartirbûna hişkesaliyê, bilî vê yekê û bi gotina karnasan, rêya lêdayî li nav wê golê anku “otobana Kelanterî”, bûye sedema bergirtina hundirê golê û çikbûna beşek ji golê, li pey xwe aniye; Ji aliyê din ve û pêka gotina karnasan qasa şoratiya avê li beşa bakûrî 24 heta ji sedî 26 e ku nêzî dû hember şoratiya beşa başûrê wê golê ye.

Di wan salên dawiyê de gelek sedemên çikbûna gola Urmîyê hatine berbas ku yek ji wan sedeman lêdana hejmarê zêde ya bendavan bûye, bi awayekê ku bi dehan bendav ên ku avê paşkevî dikin, hatine çekirin û bername bo çekirina bendavên zêdetir jî hene û ava ku divê bo golê biherike bi lêdana nezaniştî ya wan bendavan hatiye kêmkirin, bilî vê yekê 70 hezar heta 80 hezar bîrên neyasayî û bi derfetnameyên neyasayî li derdora gola Urmîyê bo avdêriya erdên wer-

»»»» Doma R:4

zêriyê hatine lédan ku çendîn milyar metra 3cî, ji

kanên ava binerd têne hilên-can, em dikarin bibêjin û ew yeka tiştek nû nine belkû ji 3 dehkan berî niha ve deşt pê kiriye ku nehatiye berçavgirtin; Lewma guherînên deverî û hişkesaliyên demdirêj û kêmtirbûna barînan, avakirina vîla û baxçeyan, lédana bîrên neyasayî û nestandard ku kanên ava bin erd vala dikin, şewazên berê yên avdêriyê ku avek zêde di beşa werzêriyê de bi heder dide, herwisa birêveberiya şaş û xirab ên berfireh, dikarin di çikkirina gola Urmiyê de hejmêrin.

Bo rêgirî ji çikbûna gola Urmiyê, di deştêkê de girûpa kar a rizgarkirina gola Urmiyê li meha Rezber a sala 1392an a Rojî de hate avakirin û piştî heyamek din, Stada Zindikirina Gola Urmiyê bo sekinandina avakirina bendav, berdana av ji bendavan, birêvebirina avên bendavan û radana çemên avrêja gola Urmiyê, veguhestina ava çemê Eres û guherîna rêya



herîkîna ava çemên avrêja gola Urmiyê bo kûrahiya vê golê û birêvebirina bernameya hevsengkirina avên bin erdê hate avakirin, lê Stada Zindikirina Gola Urmiyê tevî ku nekarî gola Urmiyê zindî bike, belku nekarî rêgirî ji jinaçûna gola Urmiyê jî bike û tevî xerckirina bûdceyek zêde û alîkariyên malî yên Japonê bo zindikirina gola Urmiyê ku bo wê Stadê re hatibûn dan, heta niha şiyana rizgarkirina gola Urmiyê ji jinaçûnê nebûne.

Girîngtirîn paşhatên çikbûna gola Urmiyê

Siyasî, jêopolîtîkî û ekolojîkî; Girîngtirîn pirs di wî warî de ên wek dîrkevîtinên qewmî û

nasîyonalîzekirin û bi qewmkirin di meşa daxwaziyan û berevanî ji vî ekosîstema bi nirx, mijarek e ku di wê dawiyê de gelek tê dîtin, guherînên heşîmetî û nerizayetiyan wan li niştecîbûn di cihên nû de, kêmbûneke berçav ji hatina geştiyaran bi hinceta ji deştçûna xezîneyek a bi navê Gola Urmiyê, ji navçûna seha ewlehî li warên girîng ên weke werzêrî û xwedîkirina ajelan ku girîngtirîn çavkaniya kar û dahata xelkê vî deverê ye, bi sedema şorbûna axê û derbên bi sedema wê yekê, jinaçûna balindeyan, bo vî yekê ku jîngeh û li pey vî tendirustiya xelkê dikeve metirsiya rasteraşt, seha ewlehiyê ji vî pîve raştî gefê tê, gefên wek bagera xwêya hûr li bajarên sînorî û cîran bi berçavgirtina devera hevpar.

Eger ku ew mijar bi tevahî di paşerojek nêz a aloz de neyên berçav, lê di paşerojek dîr û demdirêj de dê bibe sedema aloziyên berfireh, çimkî karlêkeriya kawilkariyên ekolojîkî bi qasek zêde ye ku binyata ewlehî û jêopolîtîkî lawaz dike, bi gotinek din

sêgoşeya heşîmet, ekolojî û jêopolîtîkî pêwendiyên gelek nêzî hev hene, kawilkariya ekolojîkî, xelkê ber bi hejarî û derdornişîniyê ve dibe û belavbûna heşîmetê li vî devera heştiyar li ser lawazkirina pêgeha jêopolîtîkiya bajaran li warê geştiyarî, werzêrî û yên din li astên deverî, netewî ku gelek girîng û heştiyar in, şiyana cîbicîkirina rolên cuda dixê metirsiyê. Bi awayek ku di hegera çikbûna gola Urmiyê û şikeştina vî sêgoşeya baskirî, li ser xelkên niştecîyan parêzhên cîran dibe gefek micid, lewma mirov, perwerde, tendirustî, pîşe û werzêrî û yên din raştî derbên micid tînin çimkî kêmbûna sal bi sal a ava gola Urmiyê di wan 3 dehkên derbasbûyî de zêdebûnê ew rengehiyane zêdetir kirine û di doma vî rewşê de li paşerojek nêz de, gola Urmiyê ber bi çikbûna yekcarî ve dê here û paşhatên vî dê pîsîra deştên berxêr ên deverê bigre û axa vî ber bi şorati û çolbûnê ve bibe ku di encam de êdî bi ti awakê nayê bikaranîn.

Hevgirtina herdu aliyên Demokratîkan bo cihê dilxweşiya alî û partiyên siyasî yên Kurd li her çar paçeyên Kurdistanê

Hevgirtina herdu aliyên Hizba Demokratîkî tevî dilxweşbûna xelkê Kurdistanê peyamên pîrozbahiyên cuda ji aliyê, sazî û partiyên cuda ji 4 aliyên Kurdistanê û herwisa cîhanê bo Hizba Demokratîkî hatine şandin Navê wan sazî û partiyên wiha ne:

Rêxirava Enternasiyonal Sosyalişt, Kongreya Neteweyên Îrana Federal, Tevergera Rizgarîxwaziya Demokratîk a Kurdistanê, Partiya “El Partî ya Sûriyê, PDK-Xoybûn ji aliyê Elî Cahid Kirac, Enistîtoya Kurd li Washington, Partiya Yekgirtûya Îslamî ya Kurdistanê, Partiya Şepêla Azadî ya Kurdistanê, Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Komîteya Cîbicîkar a Şepêla Paşeroja Kurdistanê Sûriyê, Partiya Demokratîk a





Em pêkve bihêz in, û bi yekîtiya xwe agirê tekoşînê geş dikin

Kurd li Sûriyê, Payama hevpar a “Kongireya neteweyên Îrana Federal, Şewreya Demokrasîxwazên Îranê û Yekîtiya bo Azadî û Wekhevî li Îranê”, Rêxirava Mucahidîna Xelqê Îranê, Partiya Wekhevî Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Partiya Yekîtiya Demokratîk a Kurd li Sûriyê, Partiya Demokratîkî Pêşvero ya Kurd li Sûriyê, partiya Demokratîk a Kurdistan-Sûriye, saziya Xebat, KNK, Partiya Sosyaliştîk a Kurdistanê, Navenda Revenda Kurdistanê, Partiya HAK-PAR, Partiya Komeleya Zehmetkêşan a Kurdistanê Îranê.

“Mustafa Ozçelik” Serokê Giştî yê PAKê(Partîya Azadiya Kurdistanê:“Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, li ser rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed rû birpirsariyeke neteweyî û dîrokî ye.”



“Mustafa Ozçelik” Serokê Giştî yê PAKê(Partîya Azadiya Kurdistanê)

Min digel rêzdar “Mustafa Ozçelik” Serokê Giştî yê PAKê(Partîya Azadiya Kurdistanê)hevpeyvîn li derheq yekbûna herdu Demokratên pêk anî navbirî wiha got: “Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, li ser rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed rû bi rûyî berpirsariyeke neteweyî û dîrokî ye.”

P: Silav û rêz rêzdar Mistefa Oizçelik di destpêkê de hûn yekgirtina herdu baskên Hizba Demokratî çawa dinirxînin?

B: Em bi dilxweşî pêşewazîya yekbûna herdu baskên Hizba Demokratî dikin; em rêzdarên Mistefa Hicrî, Xalid Ezîzî û hemû rêvebir û endamên herdu baskên Hizba Demokratî bi dil û can pîroz dikin. Di demeke ku risk û xeterî li gel şans û firsendên dîrokî bi hevdu ra li ber deriyê gelê me yê Rojhilatê Kurdistanê ne, yekbûna herdu baskên Hizba Demokratî, rol û girîngîyeke taybetir û dîrokî dilîhîze. Hizba Demokrat a Kurdistanê Îranê, li ser rêbaza Pêşewa Qazî Mihemed rû bi rûyî berpirsariyeke neteweyî û dîrokî ye. Yekbûna herdu baskên Hizba Demokratî dê ji bicihanîna vê wazîfe û berpirsariya dîrokî ra rê xweştir bike.

P: Bi nerîna we yekgirtina herdu baskên Hizba Demokratî çî bandorek bona ji hev nêzîk kirina partiyan din yên Kurd li çar parçeyên Kurdistanê de hebibe?

B: Di dîroka Kurdistanê da, tu demê wek vê dema ku em

tê da dijîn, her çar perçeyên Kurdistanê di vê astê da tesîr li hevdu nekirine. Xweşî û serkeftineke perçeyekî jî, êş û nexweşîyeke perçeyekî jî bi berfirehî tesîra xwe li perçeyên din dikin. Ji ber vê raştîyê, yekbûna herdu baskên Hizba Demokratî, ne bes li Rojhilatê Kurdistanê, herwiha li Bakur, Başûr û Rojavayê Kurdistanê jî, bûye cihê dilxweşiyê, bayekî hevî û bawerîyê belav kirîye. Ev tecrube ji bo her çar perçeyên Kurdistanê jî nimûneyeke heja ye ku, pêwîstiya yekbûna hizbên wek hev derdixe pêş. Li her perçeyekî Kurdistanê, hemû hizb û rêxistinên ku wek bername, wek rêbaza siyasî û xebatê wekhev in, divê di nav yek partiye da bibin yek û ev tecrûbeya herdu baskên Hizba Demokratî jî vê îspat dike ku, gava ku xweştin û dilsozî hebe, tu tişt nikare li ber yekbûnê bibe asteng. Herweha yekbûna herdu baskên Hizba Demokratî, ji bo hevkarî û tifaqên neteweyî, niştîmanî yên li her perçeyekî Kurdistanê jî rê xweştir dike, vê pêwîstiyê zêdetir derdixe pêş.

P: Rêzdar Mistefa Oçelik cudahî kevîna dinav partiyan Kurdî de çî xisarekê li tevgera rizgariya gelê Kurdî dixê?

B: Gava ku me partiya xwe PAK(Partîya Azadiya Kurdistanê) ava kir, me ji bo Bakurê Kurdistanê rêbazek da ber xwe. Me got “Yên wek bername û siyasî û rêbaz wek hev in, nêzî hevî divê di nav yek partiye da bibin yek. Yê ku din av yek partiye da nikaribin bibin yek, bila hevkarî û tifaqan bikin.

Yên nikarin hevkarîyan bikin bila di nav diyalogê da bin. Yê nikarin diyalogê jî bi hev ra bikin, bila dijîminatîya hev jî nekin”. Li her çar perçeyên Kurdistanê jî partiyan ku wek hev in û divê bibin yek, gava ku vê yekbûnê pêk neynin, heza xwe jî, heza giştî ya neteweyî jî, lawaz dikin. Partî û rêxistinên ku divê tifaq û hevkarîyên

neteweyî, niştîmanî pêk bînin, gava ku vê watîniya xwe bicîh neynin, azadî, rizgariya û serxwebûna her perçeyekî Kurdistanê zêdetir bi paş dikeve. Bêtifaqî, cudahî gelê me jî bêhevî dike, doza niştîmanî lawaz dike, nahêle ked û bedel û xebata bi dehan salan geştir û xurtir bibe. Bêtifaqî herweha hişmendî û bawerîya neteweyî jî lawaz dike. Bêtifaqî, di qada navneteweyî da jî, bêbawerîyekê çêdike û peywendî û destkeftinên dîplomasiyê lawaz dike. Bêtifaqî rê dide ku xêrnawaz û dijîminên gelê me, ji vê bêtifaqîyê feydê bigirin, nakorîyên nevwexweyî kurtir bikin, bi aliyên me yê lawaz bilîzin. Bêtifaqî rê dide ku, temenê dagirkerî yê, neheqî yê û tune hesibandina mafên neteweyî yê mîletê me dirêjtir bikin, azadiya welatê me paşdetir bikeve.

P: Rêzdar Mistefa Oizçelik, yekgirtina Partiya Demokrat li Rojhilatê Kurdistanê çî bandorekê li ser dagirkerên Kurdistanê he ye?

B: Yekgirtina herdu baskên Partiya Demokrat li Rojhilatê Kurdistanê, hevî û bawerî û heza hişmendîya niştîmanî dê xurtir bike. Ji ber vê jî, beriya her tiştî ev yekbûna tirseke mezin dê bixê dilê Rejîma Îslamî ya Îranê. Yekbûna herdu aliyên Hizba Demokratî nişan û destpêk û mesaja vejîneke nû ye. Ev vejîna jî xof û tirsekê dixê dilê Dewleta Îranê. Yekbûna herdu aliyên Hizba Demokrat li Rojhilatê Kurdistanê dê rêya tifaqa neteweyî xweştir bike, dê heza niştîmanperweran xurtir bike. Ev jî dê darbeyeke mezin be li ser Dewleta Îranê. Yekbûna herdu aliyên Hizba Demokratî dê li qada navneteweyî da dostên kurdan zêdetir, dijîminên wan kêmtir bike, dê heza kurdan xurtir bike. Ev jî dê dîsa darbeyeke mezin be li ser Dewleta Îranê. Li kîjan perçeyekî Kurdistanê da Kurd di nav xwe da tifaqekê çêbikin, destkeftinekê bidest

bixin, ev dê destkeftina hemû kurdên cîhanê be, herweha dê şikesta her çar dewletên dagirker be. Îro dewletên dagirker ji bo rê li ber pêşketin û destkeftinên her perçeyekî Kurdistanê bigirin, bi tifaqeke pîr alî plan û hewl û êrîş û siyaseteke hev beş a li dijî kurdan dimeşînin. Ji ber vê yekê jî yekbûna herdu aliyên Hizba Demokrat li Rojhilatê Kurdistanê, ne di berjewendiyên her çar dewletên dagirker da ye û dê zerarê bide planên wan ên xêrnawaz.

P: Dawîn pirs rêzdar têkliyên we digel Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê çawa in?

B: Em wek PAK, rêbaz û wasiyet û têkoşîna Pêşewa Qazî Mihemed wek rêbaz û têkoşîna xwe dibînin. Em Pêşewa Qazî Mihemed, Dr. Qasimlo, Dr. Şerefkendî wek şehîdên xwe dibînin. Em, Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê wek partiyeke bira û dost dibînin. PAK partiyeke 8 salî ye, lê kadirên ku PAK ava kirine, 30,40,50 salin ku li Bakurê Kurdistanê bi bedelên mezin, têkoşîna azadî, rizgarî û serxwebûna Kurdistanê meşandine. Bi salan e ku, di astên cuda cuda da, peywendiyên wan kadiran bi Partiya Demokrat a Kurdistanê Îranê ra hene. Piştî ku me PAK damezrand, peywendîyeke me ya germ, dostane û birayane bi PDK Îranê ra hatiye hûnandin. Gelek caran me di asta herî bilind da hevdîtin çêkirine. Peywendîyeke me ya berhemdar û baş heye. Em wek PAK partiyeke Bakurê Kurdistanê ne. Lê, em xwe alîkar û piştgirên doza azadiya xwîşk û birayên xwe yê Rojhilatê Kurdistanê jî dibînin. Em daxwazkar û piştgirên hevkarî, tifaq û yekbûnên partî û rêxistinên Rojhilatê Kurdistanê ne.

Gelek spas kek Mistefa Oziçilik bo we ku dema xwe bo dema texand kir. Serkevîtinê ji bo we û tev endamên partiya we hevî dikim, rojnameya Agirî.

Nerîna Lîderan



Volodymyr Zelenskyy:

“Rûsiyê dixwaze jiyana asay-
iya Ewropîyan ji nav bibe”.



Joe Biden:

“Em destê Îsrailê li derheq
Îranê girê nadin”.



Josep Borrell:

“Baweriya min bi gihîtin bi
encama Bercamê kêmbûye”.



Mithem bin Selman:

“Em xwaziyarê bihêztirbûna
karên hevpar ên erebî ne”.

Alman dixwaze girîngiyê bide çand û zimanên cuda



N: Eskender Ceiferî

Tora ragihandina pirrengî
li Almanyia ya kar ji bo
saleke din jî bûdceyê ji xwe
re biştîne.

Êdî biryar e ew tor, heya
dawiya sala 2023'an xebatê
bike û piştê jî dibe ku careke
din dewlet piştevaniya wê
bike.


Di salên derbasbûyî de li Al-
manyayê toreke ragihandinê
bi piştevaniya dewletê hate
ragihandin ku tê de zimanê
Kurdî jî li kêleka zimanên
hin neteweyên din bicih e.

Navê wê, Tora ragihandinê
ya pirrengî ye! Vê torê di
daxuyaniya xwe de ji xeynî
zimanê Almanî, cih daye
pênc zimanan ku Fransî,
Erebî, Ingilîzî, Kurdî û Potro-
galî li xwe digire.

Di daxuyaniya destpêkê ya
karên vê torê de hatiye: Em
çalakvanên ragihandinê bi
pêşîneya koçberî an jî pe-
naberiyê ne û hertim heşt bi
rastgirî an jî nijadperezî û
newekheviyê dikin. Li ser me
gelek tê axaftin lê belê ne bi
me re.

Em xelkê bi pirojeyên ragi-
handinê re li hev girê didin
û dengê xwe hildidin û
destêverdanê dikin. Em bi
perwerdekirin û lihevguher-
tina nerînan, hevdu xurt
dikin. Emê bikarin ji bo her
kesî toreke cûrbicûr û pirreng
biafirînin.

Girîngiya vê torê ji bo Kur-
dan ev e ku zimanê Kurdî
jî, li kêlega hin zimanan cih
girtiye ku xwedî dewlet in û
di asta navdewletî de jî tên



bikaranîn.

Di beşeke din de ji em dixwazin bi hêza ragihandinê, bîn
guhdarînkirin û xwe têgihîştî bikin û meyl û heza kesên din jî,
ji bo vî karî zêde bikin. Em xwe ji bo tevlibûn bo guhertinên
demdirêj û berfirehkirina ragihandinê, berpirsyar dibînin.

Armanca me, civakeke vekirî, pirreng û mayînde ye. Tora
ragihandinê ya pirrengî, tora me ya nû ye ku ne tenê girêdayî
çandekê ye.

Em ragihandinkarên ji welatên cuda, zimanên cuda û dîrok û
pêşîneyên cuda ne.

Em dixwazin civakeke pirreng li vir pêk bînin.

Lê ji ber ku ev cara yekemîn e saziyek ku bi piştevaniya
dewletê tê avaki...



»»» Doma R:9

Qewîtiya Bav û Bapîran “Tifaq û Yekgirtin”



N:Ebdûlazîz Qasim

Yekgirtina herdu baskên Partiya Demokrat a Kurdistan-Îranê, dilxweşiyek di nava milletê Kurd de peyda kir, û ji aliyê milletê Kurd li Rojavayê Kurdistanê jî ev gav bi peyamên pîrozbahiyê, bi dilxweşî, bi destxweşî û bi germî hat pêşwazîkirin û herwiha bi gaveke pîroz û dîrokî hat nirxandin.

Girîngiya yekgirtin û tifaqa milletê Kurd, yekem car di nav deq û nivîsên helbestvan û feylesofê Kurd Ehmedê Xanî de, bi taybetî di beyta “Derdê Me” ya “Mem û Zînê” de bi regekî berçav hatiye wekî binyat ji bo man û hebûn û serfiraziya Gelê Kurd, û paşî ev daxwaz bûye karname û bernameya rêxistinên Kurdî û ji aliyê rêberên Kurd tekezî li ser hatîve kirin û di nivîs û tek-

stên cuda cuda yên Kurdî de hatiye dubarekirin, tevî ku girîngiya yekgirtinê di gelek metelok û serpêhatî û gotinên pêşiyên me de hatiye ji wan wekî nemûne: “Maleke bi tifaq ji Êleke bê Tifaq baştir e”.

Wekî em dizanin ku rêberê Kurd Şehîd Pêşewa Qazî Mihemed serokkomarê Kurdistanê, bi çend demjimêran berî bihête bidarvekirin, wesîyeta “qewîti” xwe nivîsî û tede bal kişandibû li ser girîngiya yekgirtina milletê Kurd, ji ber vê yekê piştraşt dikarim bêjim ku her yekgirtineke Kurdî û bi taybetî yekgirtina binemala Demokrata Kurdistan-Îran, beşek ji şîret û qewîtiya bav û bapîrên me ye.

Helbet ku Partiya Demokrata Kurdistan-Îranê, partiyek mezin û dîrokî ye û xwedan ezmûneke dîr û dirêj heye, lê dixwazim diyar bikim ku hindek cudahî di navbera yekgirtin û tifaqê de heye, hevdem wekî dost û alîgirekî vê partiyê “Partiya Şehîdan Pêşewa û Dr. Qasimlo û Dr. Şerefkendî” ku hêvîxwazim



ev yekgirtin bibe pirek ji bo pêkanîna tifaq û yekrêziya tevgera rizgarîxwaza Kurdî li Rohilatê Kurdistanê.

Li dawiyê, dixwazim bêjim ku tiştê balkêş û sersam, bo min aliyê protokolî bû û bi taybetî rêûrismên îmzekirina yekgirtinê, û pevguherîna kaxezan di navbera herdu rêzdarên Mîstefa Hicrî û Xalid Ezîzî de bû, ku vê yekê gelekî bala min kişand, û li vir dixwazim tekeziyê li ser xalek girîng bikim ku ew jî “hevpeyvîn û diyalog” e, ku divê ew “diyalog” ya

dirêj di navbera herdu baskên Partiya Demokrata de û bûyî egera bideştixistina vê yekgirtinê, berdewam bimîne û bihête parastin, xwedan kirin û bi awayekî zaniştî kar ji bo serxistî, pêşxistî û bihêzkirina vê yekgirtinê, herwisa kar bibe li ser mekanîzmayên durîst û saxlem ji bo kêmkirin û çareserkirina nakokiyên partiyetî û kesayetî, û parastina sewerî û serbixweya biryara siyasî û leşkerî ya binemala Demokrat û hêza pêşmergeyên wê yên qehreman.

John Bolton: “Hêvî dikim xelkê Îranê hikûmeteke hilbijartiya xwe hebin ku hêjayê vê yekê ne”

“John Bolton”
Şewîrmendê ber
ê yê Ewlehiya Netewî yê
Amerîkayê

Şewîrmendê berê yê Ewlehiya Netewî yê Amerîkayê “John Bolton” di hevpeyvîn digel Tishk TV”ê de gotiye:

“Hêvî dikim xelkê Îranê hikûmeteke hilbijartiya xwe hebin ku hêjayê vê yekê ne”.

“John Bolton” gotiye: “Bo vê yekê dixebitim ku rojek bê xelkê Îranê bikarin deştilata xwe bi awayek azadane hilbijêrin û welatê wan ji aliyê wan kesan ve bi rê ve here ku, hilbijartiyê xelkê bin ne bi deştê wan kesan bi rêve here ku li ser wan hatine sepandin û îxanetê li wan



dikin, bi taybet bo Kurdan ku bikarin bi azadî bijîn. Şewîrmendê berê yê Ewlehiya Netewî yê Amerîkayê gotiye ku, jiyan û kultura Kurdan piştî şoreşa sala 1357an a Rojî ve, gelek dijwar bûye lê ez wisa hizir dikim ku, xelk hêvîdar bin ku dever di rewşa guherînê de ye û dikarin mafê xwe bi deşt xwe ve binin.

Herwisa navbirî gotiye: “Ez vê yekê jî dizanim ku xelkê Amerîkayê aghdarê êş û janên we ne, lewma hêvîdarê paşerojek geş bin. Alxayîn im ku xelkê Amerîkayê jî daxwaziya azadiya xelkê Îranê û Kurdan hene ku rojek bigihîjin vê azadiyê ku xelkê Amerîkayê hene, hêvîdar im rojekê ew derfet bo we jî bê pêş.

Beşdariya siyasî ya jinê li civakê de û wilayeta jinê li Îslamê de



N: Vênûs Fayîq

W: Hesên Mukerem

يأيتها النبي قل لأزواجك وبناتك ونساء المؤمنين يدنين عليهن من جلابيهن ذلك أدنى أن يعرفن فلا يؤذين وكان الله غفورا رحيما (الاحزاب 59)

Axavtin li derheq beşdariya siyasî ya jinê li bazneyên biryar şandin û herwisa li barê birêvebirina civakê û çalakbûna wê di nav partiyan de mijarek nû nine, ev pirsê han digel dirûstbûna ramana dewletê û birêvebirin û anîna gorê a şewazên birêvebirin û deşhilatdarî û pel havêtina wan şewazan li seranserê civakekê de behs jê tê kirin. Lê, di cîhana pêşkevî de ku, fêmkirina girîngiya jiyana aştîyane ya bihevrebûnê ya di navbera herdu zayend û bihevrebûnê birêvebirina civakê vekirîye, behs ji berfirehkirina û zêdekirina deşhilatan û beşdariya jinan çî li warê çandî ve û çî jî li warê çawanîyê ve, veguharîn li ser de pêk hatine.

Di demekê de ku li welatên paremayî yê li Rojhilatê de ku Kurdistan pişkek ji vê ye û xwediyê ezîmûneke

nîve serbixwe ye û herwisa bangeşeya demokrasîyê dike, hîn jî nekariye di nav cîhana siyasî de behs ji çawanîya erêkirina jinê weke şîrîkê mêr li warê siyasî de, bi micidî encam bide û li şûna vê de pêngaveke xwedî reh û bingehîn ber bê wî alî we havêje ku hêjayî wî serdemî be.

Temaşe bike hîn jî li Kurdistanê de, lojîka êxsîrbûn û girêdayîbûn ku bingeha felsefe û dîtingeha eqlî ya xelkê wê de vera paremayî ye, li mijareke weke beşdarbûna siyasî ya jinê di civakê de nîşan dide.

Mijara beşdarbûna jinê li jiyana siyasî û birêvebirinê, her digel serhildana hizra olî û dirûstbûna yekemîn dewleta olî, serîrakirîye û gengeşeyeke zêde li ser e. Herçend ku ol li hewleke tund û rijd de ye bona daxistina wan behs û gengeşeyan û hêlana vê di nav (tabloyeke) daxistî de, ku îmkana lêkolînkirin û deşkariyê nine. Hev dem digel hewla kipkirina wan dangan jî bûye ku daxwaza akitivkirina rola jinê di nav bazneyên biryarên siyasî de dikin. Her ev pîrensîpa olî jî ku di nav riha edet û kûltûra civakê de reha xwe dakutaye û bûye beşek ji kûltûreke nerewaya nebiçî ku amade nine ti yek ji deşhilatan li deştê jinê de bibîne.



Her nihêrîneke bilez li tev te'îlîmên Qora'anê de dibînin, her hemû ji wan bona lawazkirina jinê bi wî şewazî ye ku di dawiyê de ti amadehiyek û mercek tê de nebe bo wergirtina ti deşhilatekê, bo sînûrdarkirina hereket û çalakiyên jinê bi armanca vê ku mafê biryar şandinê tunebe, weke mijara pir jinî ku, maf dide bi mêr hev dem çar jinan bi hevê kombike û bixwe bi tenê bibe serdest û pêşewa û bajo. Mijara mîrat ku tenê mebeşa vê lawazkirina jinê li warê aboriye, bo vê ku hertim hewcedar û mindarê deştê mêr be û bide selmandin ku jin li mêr kêmtir e, û herwisa bi vê newekheviyê jî wisa bike ku şiyana vê yekê tunebe da ku weke zayenda beramber deşhilatê bigire deştê xwe. Hebûna wan mijaran û herwisa gelek mijarên din di nav pirtûka pîroz ya Qora'anê de û piştî jî zeliqandina wan weke yasayê bo birêvebirina civakê bo vê ku

jinê weke êxsîr bihêle û ti demî şiyana wergirtina deşhilatê tunebe û ti mafdariyekê guman neke bona daxwazkirina parvekirina deşhilatê bo birêvebirina digel mêr de.

Dawîn car wisa kirîye ku ti yasayek ji wan civakên weke Kurdistanê ku bingeha yasadanîne ayîn e û yasaya bingehîn ya welatên wan li ser bingeha hizra aynê hatiye darêtin, tenê bo mebesta sînûrdarkirina deşhilata jinê ye, ji bo vê ku ti demî di asatekê de xwe nebîne ku daxwaza deşhilatê bike. Ji bo mînak heta niha di wan deveran de ti yasayek nine ku jinek di danîna yasayê de beşdar kiribe, her weke demên berê ku hertim tev berjewendiyên mêr tê de paraştîye û jin li peravêzê de ragirtiye bona erkên duyem an bê wate. Herçawan ku li hedîsê de jî dibêje: “


”لا يفلح قوم اولوا امرهم لأمراء

Piştîre di civakekê de ku bingeha yasadanîne şerîe`te olek be, û di ayeta Qora'anê

وَأِنْ خِفْتُمْ أَلَّا تُقْسِطُوا فِي الْيَتَامَىٰ فَانكِسُوا مَا طَابَ لَكُمْ مِنَ النِّسَاءِ مَنًى وَثَلَاثَ وَرُبَاعَ فَإِنْ خِفْتُمْ أَلَّا تَعْدِلُوا فَوَاحِدَةً أَوْ مَا مَلَكَتْ أَيْمَانُكُمْ ۚ ذَلِكَ أَدْنَىٰ أَلَّا تَعُولُوا (3) سورة النساء

dibvê çî pêgehek bo jinê

Çîrok: Bê dengî



N: Bêhzad Qadirî

W: Hesên Mukerem


Heta ku çav dibîne, reşahî û tarîtiye. Navilvilêm û mêzeyî reşahiyê dikim.

Ewqas temaşeyî wir dikim heta niqomî nav vê dibin, an vê niqomî nav xwe dikim! Girîng nine, girîng tevlibûne,

girîng yek bûne, yekreng bûne...

Navilvilim, weke ne tiliyê min yê min bixwe bin û ne pêyên min û deştê min. Herket nakim û laşê xwe dispêrêm bi tarîtiyê.

Ez bixwe mame û gurmêna dilê xwe û herikîna xwîne di nav demarên min de digel mîstek mejî û demarên eseban. Ez bi tena serê xwe mame û heta çav dibîne tarîtiye. Ne sînorek xuyaye, û ne jî cografîyayek, ne tanpoyek û ne rengêk.



Tawani Pîroz
Bêhzad Qadirî

Gurmîna dilê min, ez diêşandim. Ez dixwazim mejiyê min jibîr bike her weke

çawan ku heştî û tiliyên min spartin ni tarîtiyê, wê her ji wî ra bispêre.

Pir zehmete û gurmîniyên min hêdî hêdî xwe tarîtiyê dida û di nav valahiyê de dibe bi şîpelek radyoyî.

Dengê xwîne di anv demaran ez azar didam. Dixwazim mejiyê min vê jî jibîr bike û vê bispêre bi tarîtiyê.

Ez naxawzim seh bi ti vilvîneke nav laşê xwe bikim. Ez dixwazim hêdî hêdî rihê

»»» Dom R:10

»»» Doma R:9

xwe radeştî tarîtiyê bikim. Ez dixwazim li etomekê sivikitir bibim, naxwazin li nav xaneyên laş de bimînim, ez naxwazim dîtîne di çavên xwe de teng bikim, naxwazim bihîştîne di guhên xwe de sînordar bikim.

Ez dixwazim bi rihê xwe bi derûna xwe û bi hemû hebûn û nebûna xwe seh pê bikim. Ez dixwazim tevî derbasiyê bibim.

Bi bê laş û bi bê gurmîna dilê xwe, xwe rasdeştî tarîtiyê dikim, niqomî bédengiyê dibim. An wê niqomî xwe dikim, dixwazim bîr ji xwe bikim û dixwazim yaku min heye bibîr bînim û yaku bi hizr min raşte û yaku bi hizr a min dreve jibîr bikim.

Dixwazim yaku min heye ji xwe dûr bikim û tenê tenê seh bi vê bikim. Dixwazim tev hêz û wizeya veşartî ya xwe bikar bînim û seh pê bikim.

Seh bi tevî bûnê dikim an ez parek im li tarîtiyê an jî ev pareke ji min. Ne girtîgehek di navê laş heye û ne jî bêhnek bi nav gurmîna dil. Ne dihisim û ne jî dibînim tenê seh pê dikim, min xwe jibîr kiriye, êdî laşê min parek ji min nine.

Zêdetir tevî dibim. Seh bi gurmîna porotona nav etomekê dikim ku elekteron di nav de dizvirin weke Heyvê bi dewra gerdûnê û weke gerdûnê bi dewra rojê. Weke koma rojê li dewra keşkeşanê de..

Çiqas mezin in ji piçûktirîn tişta jiyanê lê, bi vê mezinahiyê jî wizeya xweragiriya çend deqeyên zivrîna elekteronê li dewra porotonê min tune ye.

Paşve dikêşim seh bi herîkîna avekê dikim, aram û li ser xwe. Rihê min dinazîne, ji bo xeveke heta hetayî, weke deştê melaîkeya mirinê, weke ramosana periya evînê.

Demarek ji hûrgliyên axê divilvilîne, av diherike. Avek ku weke mar xwe dixişîne. Gulek û çend pel tî ne. seh bi

niqombûna guldana kêlega xwe dikim. Di nav hudnî xwe de di tarîti û di bédengiyê de...

Nikarim xwe ji ber ewqas aramiyê ragirim. ditirsim bibim parek ji wê û heta mirinê çavnhêrî perdaxeke av ji deştê mirovekê bibim. Ditrism mirovek min bêhn bike an min hilmje. Ditirsim hişk bibim û hilverim.

Dizvire û dizvire, seh bi zivrîna navka wê jî dikim, seh bi kelyana “Magmayê” jî dikim, dojehek di halê kelyanê de ye, ti pêst û heştîyek nikare heta rêjeya germahiya wê jî bipêve, gelek nearam ji vê yekê ye ku me hizr lê dikir.

Di bê dengiyê de, denge dengên ecêm min bo aliyê xwe radikêşin. Nizanim dengê kelyana “Magmayî” an zivrîna gerdûnê bi dewra xwe ye! Nizanim dengê zivrîna Heyvê ye bi dewra gerdûnê an zivrîna gerdûnê bi dewra rojê?! Renge stêrkek bi-mire an stêrkeke din jidayîk bibe...

Ev dengên han ne yên niha ne nû nin, ev heyama salên dûr û dirêjin ku digel gerdûnê dizivrin. Ev jî benda wizeya rakêşana gerdûnê ne.

Ev heyama salane ku me xwe jê ker kiriye. Û navê bédengiyê li ser sepandiye. Ev heyama sala ne ku çengê xwe ber bi gerdûnê ve berdane û ber bi eniya valahiyê pel dikutin. Lê, aştare Ozonê bi wan kun nabe û seh pê dikin.

Deng tê û xişên tê, cîre cîr, hirên, hîle hîl, gurmin, xurmên, qirçîn, hare har, hawar û nalîn tê, girî û pêkenîn, hêvî kirin tê, deng tê û deng tê...

Seh bi hebûna yekem dikopa baranê ya tevlîbûn bi axê dikim, seh bi yekem yekgirtina etoman dikim, seh bi yekem gurmina dilê nav av û yekem henaseya li ser gerdûnê û yekem dengê ku li hev kê derkevtiye dikim, seh bi şînbûna yekem giya û vebûna yekem kulîlkê dikim...

Seh bi yekem azaran dikim,

renge qîrîna yekem nêçîrê bibe an qure qura zikê yekem nêçîrvan be.

Dengeke xweş tê! Gihîştina jinekê bi orgazimê be.

Dengek tirsnak tê, yekem dayîk janê digire, û yekem zarok digirî, seh pê kiriye ku di çi dojehekê de jidayîk bûye, an biryare ku çi dojehekê biafirîne.

Rihê min bi yekem dara tûjkirî birîndar dibe bi yekem leqa li goşt dişevte, bo kudrê zivîrme?!

Ber didim û paşve dikêşim; Vedikêşim û serê xwe li kevrekê dixim! Nalîna koleyekê min radikêşe, seh bi azara qamiçiyên li ser pişta vê dikim, seh bi giraniya kevirên li ser pişta vê dikim, bi heştîyan seh bi şikandina heştîyên vê dikim. Erê çi diqewme!?

Biryar wisaye ku bi hezaran rih pêkêşî xwedayan bê kirin û ehramek bimîne.

Biryar wisa ye hezaran jiyan bîn kuştin û “Maya” bibin xwediyê welatekê. Biryar e “Maçûpîçû” li kevrân bê tiraşîn û bi hezaran kendox bibin gorî û roj bibe xwedê.

Biryar e, dîwarek li dewra Çînê bê danîn û bi milyonan laş bibin kêvirin nav kevrân û emperatorek şûran biparêze.. Gurmên tê û gurmên tê, gurmêna pê hezaran serbazan tê. Zinge zing tê û zinge zing tê, zingîna bi milyonan qifil û zincîran. Şûr û rim esman kun dikin.

Nalê hespan erdê dihejînin, hêre hêra wan hîn jî li dewra erdê bende, şerekê dikin, şerê wan nine. Nalîna serbazan hîn jî li çavnhêr e, erd birînen wan beredayî nake, heta ku mane, dê binalîn, heta ku mane mekûm bi kuştinê ne û birîndar û mirin û mirin?! Ji ber çi?! Bi çi sedemekê?!

Gerdûn dizivire û dizivire û bédengî qerebalix û tundtir dibe. Hîn qîrîna bi milyonana zarokan di hewa de ye, seh bi lorîna bi milyon jin û mirên serjêrkirî dikim. Wir

ç igirtîgeheke mezin e û em wiha hesab dikin ku împratorê tev kekeşananin!

Xwazî min ixwe li demê de tevlîbûna wê gula bida û hildveriyam. Xwazî ez dibûm bi pirotonek û eleteronek di-kre evîdarê xwe. Xwezî “Bîg Beng”ek nebam û em tev di vê tunebûnê de bimana... Lê deng tê, bêhn tê, bêhna bi hezaran mirovan ku li Hîroşîmayê de bûn bi hilim. Li derdora min bêhna sêv û pirtqalan tê! Bêhneke mirinê, bêhneke dîktator, bêhenek hov.

Seh bi firîna 5 hezar perperokan dikim. Nêzî min in! seh dikim laşê min bûye bi 5 hezar perçe û ji Şarezorê ve rêya keşkeşanan girtiye ber xwe. Bi firîna wan azar digihîje min, seh bi xenqînê dikim, seh bi şewatê dikim, seh bi mirinê dikim.

Ji aliyek din ve keçîkê radikêşin, Kurdekê xaç didin, narincikekê dihavêjin nav malekê de...

Fermane û fermane û fermane, enfale, enfale û enfal, zeytûn, zeytûn û zeytûne. Peyvên pîroz jî dictator in, dixwazin me qir bikin.

Rihê min çemdiye. Yaku digel gerdûnê dizivire êdî dengê koleyên Misir û Çînê ninin, nirêna serbezên hov yên Çengîzخان nine. Bê dengî li hundrî min de dikele!

Dengê min bixwe ye demaku min bidar vedikin, dema ku min gulebaran dikin, dengê min bixwe ye, di sir û seqemê de, di bin bareke giran de, li ser sînoreke deştîkird de. Dengê min bixwe ye ku tevî henaseya hespeke serxweş kiriye. Ev jî dizivire digel gerdûnê digel rojê û digel keşkeşanan. Digel magma dikele û digel her birînek neheq dikele. Bédengî di hundrî min de dikele!

Bê dengî tev tarîtiyek ji min dagîr kiriye û niha tenê seh bi vê yekê dikim. Hikume û divê digel de bijîm û digel de bizivîrim, heta hetayî, heta roj diteqe û gerdûn ji gerê radwaste.

Binpêkariyên mafê mirov di Kurdiştanê de

Kolberekî Kurd bi sedema teqîna mînê bi awayek dijwar birîndar bû

Êvareya roja Duşemî 14'ê Xermananê, kolberekî Kurd ê bi navê “Mihemed Kerîmî” xelkê gundê “Arimrde” ya girêdayî bajarê Banê, bi sedema teqîna mînê li ser sînorê “Hengejal” a wî bajarî birîndar bû.

Ew kolberê Kurd, di wê bûyerê de lingê wî bi awayek dijwar birîndar bûye û niha li nexweşxaneyê Selahedîn Eyûbî di bin çavedêriya pîzîşkî de ye.

Rewşa tendirûştîya wî kolberê Kurd nebaş hatiye ragihandin û bi sedema kûrahiya birînan, divê bo nexweşxaneyek din bê veguhasîn.

Kolberekî ciwan li ser sînorê bajarê Banê hat birîndarkirin

Roja Duşemî 14'ê Xermananê, kolberekî ciwan ê bi navê “Yasîn Se`îdî” temen 22 salî û xelkê gundê “Nave” ya girêdayî devera Nenûr a ser bi bajarê Banê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî yê hikûmetê li ser sînorê wî bajarî, hat birîndarkirin.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê teqe ji wî kolberê Kurd kirin û navbirî bi sedema kûrahiya birînan bo nexweşxaneyê bajarê Tewrêzê hatiye veguhasîn.

Her di vê derheqê de, êvareya roja Yekşemî 13'ê Xermananê, du kolberên din yê bi navên “Suheyb Raştixane” û “Soran Eyvaze” bi sedema teqeya hêzên leşkerî yê hikûmetê li ser sînorê bajarê Merîwanê hatin birîndarkirin.

Kolberekî xelkê bajarê Merîwanê li ser sînorê Newsûdê birînder bû

Roja Şemî 12'ê Xermananê, kolberê Kurd yê bi navê “Zana Îsmailî” temen 22 salî û xelkê bajarê Merîwanê, bi sedema teqeya hêzên leşkerî li ser sînorê Newsûdê, hat birîndarkirin.

Hêzên leşkerî bi bê agehdarkirina berê teqe ji wî kolberê Kurd kirin û di wê bûyerê de lingê wî birîndar bûye.

Hêzên leşkerî bi çeka saçmeyî teqe ji wî kolberî kirin û zêdetir ji 15 saçmeyan ber wî kolberî kevtin.

Ew kolberê Kurd bona tedawiyên pîzîşkî bo nexweşxaneyê hatiye veguhasîn û rewşa tendirûştîya wî baş hatiye ragihandin.

Mehmûd Sadiqî ji mafê mirexesiye hat bê par kirin

Girtiyê siyasî yê Kurd ê bi navê “Mehmûd Sadiqî” xelkê bajarê Kamêranê, ku heyama girtîgeha xwe li girtîgeha bajarê Sineyê derbas dike, ji dema binçavkirinê ve heta niha ji mafê mirexesiye hatiye bêparkirin.

Pêka gotina çavkaniyeke agehdar, berpîrsên girtîgehê çend caran digel daxwaza mirexesiya wî girtiyê siyasî, dijayetî kirine. Herwisa wê çavkaniyê behsa wê yekê jî kiriye; Navendên dad û ewlehî li bajarê Sineyê, digel azadiya “Mehmûd Sadiqî” bi pêbenda elektirônîkî dijayetî kirine.

Ew girtiyê siyasî meha Rezbera sala 1398'an a Rojî, ji aliyê taya 1 a dadgeha keyferî ya parêzgeha Sineyê, bi tohmata “endambûn û hevkarîkirin digel yek ji partiyên Kurdî” bi 30 sal girtîgeha te`izîrî hatibû cezadan.

Herwisa Reşemeha heman salê, taya 1 a dadgeha Şoreş a bajarê Sineyê bi serokatiya dadwer “Se`îdî” ew girtî bi tohmata “beşdarî li bexî” bi 25 sal girtîgeha te`izîrî, hatibû cezadan.

“Mehmûd Sadiqî” rêkevtî 25'ê Rezbera sala 1395'an a Rojî, bi bê hebûna ti belgeyên yasayî ji aliyê hêzên ewlehî ve hatibû binçavkirin û piştî derbasbûna çend mah li ser lêpîrsînê, bo girtîgeha bajarê Sineyê hatibû veguhasîn.

Endazyarekî xelkê bajarê Dalahoyê bi sedema berq girtinê canê xwe ji dest da

Roja Sêşemî 8'ê Xermananê, endazyarek bi navê “Husên Ulfetî” kurê Sultanmurad, li dema karkirinê raştî berq girtinê hatiye û canê xwe ji dest daye.

Ew endazyar, fermanberê îdareya berq a bajarê Krind a girêdayî parêzgeha Kirmaşanê bû.

“Husên Ulfetî” heyama salekê ye ku jiyana hevbeş pêk aniye û hevjinê wî pêgirane.

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE

E - Mail: Agiri2003@gmail.com

Hejmar (429)

- ◆ Rojnameya “Agiri” di van malperên jêrên de bixwînin:
- ◆ www.Kurdiştanmedia.com
- ◆ www.Agirimedia.org
- ◆ rojnamaagiri@gmail.com
- ◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

